DENGÊ KURD

24 ReŞemê 2712 k | 15-3-2013 z | DENGê KURD -Hijmar (4) | www. Pdksp.com

Li Kombûna Parîsê

Pêşeroja Rojava Yê Kurdistanê

Karname Ya Rojevê Bû

Birakujî

Şermeke mezine ko kurd bi destê kurd bête kuştin, rûreşiyeke dîrokiye û xiniziyeke netewiye, dîrok dîdevane li ser hemû bûyer û qewmanên car û bar û serpêhatiyên çavdêr û navno. Gelî kurdan: de ka werin emê hevdû navno bikin, de ka werin emê rexneyan li hev bigrin, de ka werin emê defterên hilêban ji hev re vekin, çima birakujî?! Çima em sewdanê xwenî kurdewar naponijînin di berjewendiya netewî de. şerê birakujî li ser sê bingehên ramyarî û civakî hatiye lidarxistin: 1- jîn û jiyara dêhatî û gundayetî di bîrahiya kurdî de cihê xwe çêkiriye bê ko tu livlivîneke bîrawerî xwe lê bide û xaçerêkan têde veke. 2 - sewdanê melomirarî nahêle ko jîn û jiyara mirovê kurd rê bibîne ji bo pêşketin û pêşveçûnê, da ko deng û rengê şaristaniyê li cîhana kesayetiya kurdî belav welav bibe. 3 - ne hebûna xwendin û gêrevêraneke sitratîcî di jîn û jiyara kurdwariyê de, da ko hevrêzî û pevxistina serweriya netewî biserkeve di hemû war û qonaxên pêvajoya neteweya kurd de. Ev her sê bingehên serekî çend rehendên xwenî taybet hene wek: Nakokiyên siyasî û pirsgirêkên civakî û qeyranên abûrî, li dûmahîkê ew her sê bingeh û ev her sê rehend bi hevkomî kêşedoza kurd dajo û dixîne felaketê.

RAPERÎNA QAMIŞLO

ÇAVKANiYA BUHARA SÛRYAYÊ

2 « Rewşa gelê kurd Û pêdawîstî yên pêvajo yê

3 « Jin û şoreş di nav rûpelên dîrokê de

3 « Pakrewanê peyva azad nesredîn

4 « Şêran salvegera barzanî nûjenkir

Li Parîsê tevgera kurd ya rizgarîxwaz çi got û çi xwest ?!

loloxan

Berpabûna şoreşa Sûryayê pêkvedana wênî diramatîkî li ser astê bûyer û qewmanan û torsaziyên navxoyî û navherêmî hiştin koşiş û berjewendiyên welatparêzî yên tevderbasbûyî digel pêşbînî û berjewendiyên navnetewî ko dîdar û kongir bêne girêdan li paytextên pirbînîn û girs-armancên ramyarî. Îro roj Parîs bûye civîngeha dîdareke siyasî ji bona danûstan û tênerînan li ser kêşedoza kurdî li rojavayê Kurdistanê, wa diyar bûye ko ew dîdar bûye gorepana kornameyan, lê sê bingeh û rehendên deqdar û serekî hene ji wê pirsgirêkê re: 1- mukurhatina destûrî bi neteweya Kurd di çarçûveya dewleta Sûryayê de, û ew pirsgirêk çareser nabitin jibilî lihevbûneke navxoyî ji kêşedoza wan re. 2- mafkêşan a yasagerî ji bo kargêraneke navxoyî ji devera kurdî re, da ko paşmayê navendî bête ladan. 3- lihevhatinek sitratîcî li ser hemû kêşedozên navxoyî di çarçoveya siyasetên berjewendiya welatparêzî ya payebilind ya tevderbasbûyî digel derdora navherêmî û berjewendiya zilhêziya cîhanî, û wisa dema ko lihevhatin çêbûn û tirêna siyasî kete rêçxana berjewendiya welatparêzî wê gavê ewê hemû kêşedoz û gîrûgirftên verqilandî ji heyama damezirandina dewleta Sûryayê wê bêne çareserkirin dema ko sewdan û kesayetiyên siyasî dikaribin çawa semt û armancên welatparêzî têxin çarçûveya pêşbîniya sitratîcî ji tevaya Sûryayê re û tayekariya Kurd re. Ji aliyekî dîtir ve dîdara Parîsê li pêşiya sê rehendên serekiye : 1- danîna destûrekî niştimanperwerî serekî, tekûz û serrast li ser lihevkirî ji bal hemû pêkahatan ve û nexasma çespandina mafên neteweya Kurd. 2- çareserkirina hemû kêşedoz û pirsgirêkên paşguhkirî ji serdemên bûrî ta îro roj. 3- danîna karname û bernameyên nûjengarî bo tazekirina dewleta Sûryayê ya lidarxistî li ser rêbaza (na-navendiyê) di kargêriya kar û barên welat û ruhabûn ji pêmayê sermayeyên mirovî û aborî û siyasî di neqriya lihevhatina welatparêzî de, ya ko rapiskandin jê nîne di hevdadiya Sûrya ya mezin de. lê serencamê dîdara Parîsê dimîne rawestgeheke dîtir ji rawestgehên çareseriyên çavnêrkirî ji kêşegirêka siyasî re da ko encamên şoreşê biseridin û pêşbîniyên sitratîcî di bazara siyasî de li hev werin û bikuncin çi navxoyî û çi navherêmî û çi navnetewî.

Rewşa gelê kurd li Kurdistan ê – herêm a rojava Ü pêdawîstî yên pêvajo yê

Lawkê Hacî

Her weku tê zanîn û diyar e ku dadwerî yên Sûrya yek li dîv yek ê ji serxwebûn a Sûrya yê ji sal a 1947 ta roj a îro , hîç bi rengek î ji rengan dannan bi kurdan nekir ye , ne weku miletek li ser xak a bav û bapîr ên xwe ku dijîn, ne jî yeksanî di gel de bi kar îna ye weku welatî yên sûrya yê , her û her konevanîyek nejad perist î derbar î gel ê kurd bi kar îna ye , gelek pîlan li dijî doz a gel ê kurd û hêvî yên wan hûnandin e , hemû derfetên xwe dixistine jêr kiryar û çalakî yên xwe bi merema çewsandin a nasname ya kurdî li herêm a rojava ji Kurdistan ê , kurd ji rex ê xwe ve çi weku layan ên konevanî , çi weku kesayetî yên konevan î welatparêz î serbixwe , çi tex ê rewşenbîr û hunermendan di çarçûv ê kar û xebatek a şermok de dilivyan bo bidestve înan a mafê gelê kurd ji sal a 1965 ta roj a îro , ew xebat û têkoşîn çi bi ser nexist , ji ber ew reng e kar bê hêz û seng bî beramber î rijêmek a nejad perist û sitemkar , lewra têkoşîn a wan ne hat e xemlandin bi çi serkeftinan, piştî raperîn a gel ê Sûrya yê ku beramber î rijêm a sitemkar û bê sinc, dest bi serhildan ê kir li 15- 3- 2011 û weku nav lê hatî ye kirin, bi şoreş a Surya yê û oposisyonek jê hat e afirandin û kar û çalakî yên wan li ser binyat a herfandin a ev ê desthilat ê , her weha tevger a kurd î bi taybet layan ên konevan î beşdar î ev ê kawdan ê bûn , ji bo Sûrya ke dîmoqratî û fireh netew û çespandin a maf ê gelê kurd di destûr a Sûrya de , lê piştî kar û çalakî û bizav ên ev ê oposisyon ê hat e diyarkirin bi şêweyek î zelal, ku di derbarî doza kurd î de dêmenekin ji rijêm a (baes) a nejad perist û hîn xirabtir, ev e diyar bû ji peyam ên serkird ên ev ê oposisyon ê û ew qewman ên li Ser ê kanî yê rûdan, di evê rewş a nazik û talûke de, ji gel ê kurd tê xwestin avakirn a mal a kurd î bi mebest a sitendin a biryar ên çarenûs î, bê ku çi layan ên konevan î û kesayetî yên serbixwe yên xwedan derfet ên konevan î –rewşenbîr î – hunerî – civakî jê dûr be,sîstemek bi rêk û pêk were danîn da ku her layanek ya kesayetîyek bi rol a xwe rabe , da ku hemi di gel hev bibin sengek li van rûdanan bo çespandin a daxwaz û hêvî yên gelê kurd li herêm a rojava, têbînî : ev kar ê kurdewar î bi cih nayê eger em xwe neşon ji ez ezî ya kesayetî û partîzanî,xebat û têkoşîn ji bo çespandina maf ê gel ê kurd ya diyar û zelal e , ewjî yekîtî ya hêz û gotarê ye û çi kar tê kirin ya diyar e , ew layan yan ew kes ê bibe eger ê perçebûn û paşxistin a doz a gel ê kurd , dê dîrok a kurd î laenet ê lê bîne , kî dibe bila bibe

www.pdksp.com

Bi xwedê eşqa wan ketiye dilê me

M.Emîn Sadûn



Hîna ez zarok bûm û ta vê demê bavê min hê wê serpêhatiyê ji min re dibêje , û herweha ji dost û nasên xwe re jî dubare dike, dest pê dike û dibêje: carekê mirovek ji êla me hebû,Şivaniya pezê axayekî kurd dikir,berî qewlê wî bi domahî bê, şivên ji axayê xwe re got:axayê min Îsal ez qewlê xwe nû nakim. Axa bi dora şivanê perîşan û belengaz ket, ta ku bizanê egerên ne nûkirina wî ya vî qewlî çine. Şivan ne da û ne sitand, û bi zar û zimanekî vekirî, ji axayê xwe re got: Min bihîstiye Mela Mustefayê Barzanî şoreşek pêxistiye û Mihtacî xortaye. vêca, min kirye di serê xwe de ez herim bigihimê de. Axa lêvegerand û bi devliken jê re got: Şivanê belengaz,ma Barzanî wê çi feydê bidê te, Barzanî dizanê tu heyî yan jê na. şivên kîsikê tûtina xwe ji bêrîka xwe derxist,û çikxarek pêça û pêxist ,û bersiva axayê xwe da û got: Bi xwedê Barzanî tiyê xwe ne daye min û ta ev kîsik jî carekê ji min re tijî tûtin ne kirye, lê bi xwedayê ez û tu dayîne eşqa vî camêrî ketiye dilê min û ezê herim bigihimê de. Vêca , di bawerya me de, ev serpêhatî, serpêhatiya piraniya gelê kurd de, û miletê kurd bi bawerî û vîna xwe ya azad tifenga xwe da milê xwe û berê xwe da Barzanî, û bawerî bi şoreş û rêbaza wî jî anî . ev rastîne di dîroka xebata gelê kurd de û îro mirovin ziktilik û dilgemar rabin û di bin birha nexweşiyên xwe yên derûnî de bixwazin van restiyan berovajî bikin. berî ku xwe li vê derya bêbinî rast bikin, bila baş serpêhatî û dîroka axayên xwe bixwînin , û divê ew bizanin ku berî wan hêzên mezin, rijêmên zordar , destên çepel û qirêj di demek dirêj de û bi alîkarî û piştgiriya gelek nanxwer û xwefiroşan nekarîn vîna vî miletî li ser wê rêbaza pîroz lawaz û pûç bikin. Rêbaza Barzanî ji dema şoreşa Eylola mezin ve û herweha berî wê jî cihê xwe di dil û canê piraniya gelê kurd de girtiye, û rayên xwe bi kûrahî li herçar parçên kurdistanê belav kirye, ew rêbaz di dema ku dijminê kurdan xurt û bihêz bûn, gelê kurd dev ji vê rêbazê ber neda û di singa xwe ya fireh de veşart û dilê wî yê avis bi xewin û hêviyên rizgarkirina kurdustnê li ber hêlim û bayê wê yê paqij jenî,di nava wan tengevî û astengiyan de,wan derdeserî û girêhişkan de bêbawerî û dilsarî bi gelê kurd re çê ne bû, gelê kurd ji wê rêbazê dûr neket û li ser şopa Barzaniyê nemir pêvajoya karwanê xebatê ajot û di wê rêyê de hezarên şehîdan sipartin xakê. ne tiştekî nûye, dema em bînin bîra hinan yan em ji wan bixwazin, ku li pertûka çirahilgirê vê rêbazê vegerin , li pertûka rêzdar Mesûd Barzanî ya ku di bin nav û nîşanê (dîroka tevgera rizgarîxwaza kurdî) de hatî weşandin, bibînin, ku vî pêşmergê qehreman,rêber û kurdperwer çi li ser wê girêdan û dilsoziyê gotiye,çi li ser wê wefadariyê daye xuya kirin. tevlî em dizanin ku ew mirovên dilgemar lê venagerin û naxwazin wan belgeyên dîrokî bibihîzin û bibînin , ji ber wê kula giran ya wan kûnêr û girikên ku di dilên wan de beramberî vê xebatê çêbûne, û ew kûnêr û girêk ji zikreşî û diltengiyeka gemar derdibin.rêzdar Mesûd Barzanî serokê Herêma kurdistanê, bi ron û eşkere vê yekê didê diyar kirin, û alîkarî û piştgiriya gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê û bi taybetî piştgiriya hevalbendên xwe di Partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî) de û piştevaniya vê partiyê ya bêsînor ji her du şoreşan re, ji şoreşa Eylola Mezin û gulana pîroz re, û em dizanin ku ev alîkarî û piştgirî jî di çaxekî de dihat, gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê di nav agirê tenûra rijêmeka regezperast û zordar de di hate biraştin û hemî rengê siyaset û pirojeyên tixumperestî û şovînîzmê li ser vî gelî dihatin gerandin. Di baweriya me de, gelê kurd li Rojavayê kurdistanê û nexasim Partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî) dema bawerî bi vê rêbazê anî, ne ji ber berjewendiyên xwe yên taybet pêk bîne,tevî em dizanin ku pêvajoya xebatê tucarî ji mirovên keysbaz û berjewendperistan bê bar namîne, lê her kesê bi bext di zanê ew bawerî ji ber pêkanîn û parastina berjewendiyên bilid yên gelê kurd û armancên şoreşa kurdî bûn, ew şoreşa ku îro gelê kurd li başûrê kurdistanê bi berhemên wê şadibe. Îro tiştin hene divê mirov bêje, hinga partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî) bawerî bi rêbaza Barzanî anî û pêgirî bi rêz û rawazên wê rêbazê kir, û bi xurtî û eşkere berevanî di ber de kir, hingî Kurdistan û mafê gelê kurd xewin û hêvîn nazikbûn, di dil û canê netewperwer û dilbêşên kurdewariyê de dijenîn, hingî ne zerfên Dolaran hebûn û ne jê otêlên pênc sitêrik li kurdistanê peyda dibûn . miletê kurd û pêşmergên kurdistanê tev di zanin û şahidin li ser wê serdamê, dema zikekê têr û dehê pirçî bû, dema cil û bergên sipeh û pînekirî bû , hingî û di wê demê de gelê kurd li Rojavayê kurdistanê û bi serweriya partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî) bawerî bi vê rêbaza pîroz anî û ma berdewam li ser wê rêbazê û ji ber pêgirî û piştevaniya di ber wê rêbazê de gelek serkird, endam, layîngir û heskerên partî û aşiqên vê rêbazê derd û êş kişandin û partî jî rastî gelek parçebûn û jihevketinan hat,lê îro ew rêbaz serketiye û bayê buhara wê serî hildaye, nema ne neyarê kurdan dikarin û ne jê simsar û dûvelankên wan dişin deryên xwe li ber vî bayî bigirin û ji derveyî wî bayî bijî. Mixabin gunehekê mezine îro mirov xwe bi bînê zana û rewşenbîr û bi xwazê dîrokê berovajî bixwînê,lê ev yeke ne nû ye,ji ber dema Kurd û partiyên kurdî parçebûn, ewan mirovan zimandirêjî dikirin, û bi daxwazin derewîn hêstir li ser rêk û pêkkirina navmala kurdî ,û hevgirtin û yekîtiya kurdan dibarandin, va dema ku îro kurd ber bihevtên û dibin yek jî, her dîsanê wan hêstirên derewîn bi xwe dibarînin, ma ev çi ne û çi ji kurdan di xwazin ??? gelê kurd zana û hişyar bûye, û rêya çareserkirina xwe li ser rêya pêşewa û serwerên xwe naskirye, guh nade kesên rêwenda û ji rê ketî, û baş di zane ku ew mirov nexweşin, dilgemar û zikreşin, xortên kurda nema ji diranên wan yên qîç û ramanên wan yên pûç ditirsin, ji ber ew mirov dûr yan nêzîk wê di gola gerava gemarî û zikireşiya xwe de bifetisin.

Pakrewanê peyva Azad Nesredîn

Emer isma'îl

Di gerimbûna şoreşa sûriyê de gelek qurbanî miletê sûrî dane û dide azadiyê li seranserî welatê me . Li 22/2/2012 bi destên qirêj û duvelankê rijêma Basa kevneperist bi karekî tîror nifşek ji reşkên şevê ji berêve xwe kirine dixsokê rijêmê ku ew karê şermezar kirin . Koştina lehengekî navdar mîna Nesredîn Birhik Bavê Ala xebatkarekî binav û deng ,mamostakî mêr û mêrxas ji dibistana Barzaniyê nemir giyanê xwe yê pîroz kir gorî peyva azad û serbixwe,pakrewan Nisredîn jiyana xwe terxankir ji bo evî gelê bindest me bihevre qoşma xebatê ajot ji demkî dirêj dema ku rijêma sûrî zilm û zordarî û êşkence dijî xebatkarên sûriyê nexasim li miletê kurd yê ku doza azadî û wekheviyê dikir ji pêncî salê bûrî ve , di serhildana 12/3/2004 pakrewan Nesredîn Birhik pêşîvanê serhildanê bû , em bi hevre li zindana rijêma xûnmij de bûn mêvan bihevre qoşma xebata kurdîniyê li ser rêbaza Barzaniyê nemir ajot bê rawestan ta ku jinav me barkir piştî di şûna xwede gincîneka zêrîn ji kar û xebat û navekî pîroz di mêjûya şoreşa sûriya bi tevayî şoreşa gelê kurda li rojavayê kurdistanê bitaybetî . Pakrewanê me Nesredîn xûna xwe ya giranbiha kire dihenê çira azadiyê wê bi mîne stêrek geş li asîmanê welatê me, vane bihezarê xortên kurda li şop û rêça wî karwanê xebatê dajon ta tola hemî pakrewanan bistînin û bin gorbikin rijêma zordaran . Hezar silav li gora tebin Nesredîn tê bimîne sax di dîroka gelê sûriya û gelê kurd de bi tîpên zêrîn .

Jin û şoreş

Mihemed Emîn Erefat

Can cak roso dibêje : mêr ji çêkirina afretêye,dema hûn bi xwazin peyane mezin û xudan sinc hebin ,di ve hûn afretê fêrî meznahiyê û sincan bi kin . S. cegerxwîn di bêje : jinê rabe serxwe tu destan vema Tu rextan girêde li bejna delal Digel min were da bikin em xebat Li ser min li ser te felata welt Bê gumane ku afret kaniyeke ji dan ,evîn ,û jiyanê ye afret ji afrandin hatiye , ew mirova ku mirovatiyê çêdike , xwişke, dayike ,jine ,û keçe ,lê çima îro rola wê gelek qelse di cvakê de ,tevî ku bi hin karan radibe , lê ew hîn biçûk û qelsin ,û ne likor hebûna wêye di civaka kurdî de , sedem pirin , dibe ku ji kêm têgihştina olî be , yan hîn bandore êl û eşîrtî hebe ,yan ji hin hiş û ramanên kevnare yên ku hîna peyda dibin di civaka kurdî de . Lê bandora rijîmê ya herî mezin bû ,bandora ku rijîma sûriyê li me kiribû , zor giran bû, çimkî şerekî dijwar dijî miletê me di kir , gihiştibû radeyekê ku tevgera siyasî ya kurdî gelek qels û ejqor bûbû, û bi dehan terk ketibûn nav partiyên me, û em ketibûn paşdemayînek siyasî ,cvakî ,û abûrî ,herêmên kurdî gelek li paş mabûn di hemû aliyan de ,û bi sedan belkî bi hezaran kes û mal penaber bûn di hundirê sûriyê de , li şam û heleb û hin bajarên din bo pariyê nan , bihezaran keçên kurd di kargehan de kar dikirin , û bi hezaran bê xwendin mabûn ,vê yekê bandora xwe li mêr û jinê jî di kir , ji ber van sedemên bûrî em nabînin ku jin bi rola xweyî xweristî di lîze , û tevgera wê gelek qelse.

www.pdksp.com

Mihrecana Şêranê bi helkeftina salvegera Barzanî

Bi helkeftina salvegera wexerkirina Barzaniyê nemir rêxistina Şêrwanê ya partî çend pêşankariyên hunerî lidarxistin wekû şanogeriya (bese) ya ko bi nûnerayetiya wê rabûn (Mistefa Ehmed, Raman Ehmed Muslim, Candost, Fatma Ismaîlo û Nesrîn Hac Sitêf. Ev şanogerî li ser azarkêşana Rojava yê Kurdistanê diaxive, ew jî ji danîn û derhênana (Raman)e. Ji alîkî din ve çend sitranên afirandkar hatin pêşkêşkirin ji bal gencên nû ve, wek sitrana (sala nû) ji bal Xebat Elî û Mistefa Muslim (Diyar) ve, ji gotinên (Sebra Haman) bi alîkariya hunermend (Hêsirxwîn) û koma wînî mozîkî, û di paş re çend helbestvanên nûhatî helbestên xwenî nûjen pêşkêşkirin û li dûmahîkê mihrecan bi sirûda netewî hat xemilandin.

Domîz xewna vegerê

Pêşangeheke wênekêşan (fotgirafî) hate lidarxistin li bajarê Dêrika Hemko, babet û mijarên ewan kevalên wênekêşanî çadirgeha Domîz bû ya koçberên Rojava yê Kurdistanê, ev pêşangeh hatiye birêvebirin ji bal peymangeha Bedirxan ya zimanê Kurdî û komeleya civakî ya kurdên Rojava yê Kurdistanê ya li Hewlêrê, evan herdû saziyan xelkên bajêr û derdora wî vexwendin bo evê pêşangehê temaşa bikin. Ev pêşangeha fotogirafî berhemê evan hunremendane (Yûnis Mihemed, Geylan Hacî, Rojgar Osman û Serdar Nûrî), wa tê zanîn ev pêşangeh li jêr navûnîşana (Domîz – xewna vegerê) hatiye lidarxistin.

Saziya (kîso) bo ragihandin û rewşenbîriyê

Saziya kîso hate damezirandin li bajarê Amûdê li jêr nav û durişmê (vejandina keleporê serzarekî û nivîsandî di darêjkanekî nûjen de) ev sazî kar û çalakiyên xwe bi rê ve dibe li jêr sîwana rewşenbîrî û sewdanên bîrawer de, û tewerê wênî serekî ewe ko mirov pêxemetiya yekane be di danûsitandinê de di navbera hemû çîn û qatên civakê de, û peyama evê saziyê ewe ko hemû şewatên tevlihevî û tundrewêtî û bîrtiskiyê vemrîne, û wisa ev sazî bibe pasvanekî rastûron ji peyva azad re, û wisa ewê serpirîştyar û nivîskarêd wê ewên şerê bazirganiya ramanê bikin bi hemû şêwaz û rengêd wî, û wê ji mirovan re serencama ramana mirovayetiya nûjen pêşkêş bikin da ko mirov çarçek bibe bi sinçiyên comerd.

Dîdarek rawêjkarî ji bo hunermendên Rojava yê Kurdistanê

Li bajarê Qamişlo dîdarek rawêjkarî hate bestin di navbera hunermendan de jibona guftûgoyê bikin li ser kêşedozên hunerî li herêmê, ev dîdar hate bestin jibona berhevkirinê ji kongireyê gîştî yê hunermendan, ev dîdar hemû hunermend têde beşdarbûn ji hemû bajar û bajarokên Rojava yê Kurdistanê. Kongira gîştî ewê bête bestin li jêr navûnîşana (peywenda hunermendên Kurd). Di vî kongirî de wê desteya kargêrî bête hilbijartin û encûmena kargêranê ji bo beşdarîkirinê di vejandina kelepor û pêma û hunerê Kurdî de, da ko têkeve warê berjewndiya kêşedoza gelê me.

Hunerxêrxwazî ji bo piştgîriya Rojava yê Kurdistanê

Paşî ew kawdanên tengezar û kulemerg yên ko gelê menî kurd têde derbas dibe li Rojava yê Kurdistanê çi serkutkarî û çi koçbarî ji ber wê ceng a wêrankar ya ko rijêmê ew sepandiye ser gel û jîn û jiyarê, encûmena navxoyî li Nerwîcê bi piştgîriya partiyên Kurdistanî (Hevkarî) û destpêkxwazî ji erkê welatparêzî ew encûmen wê ahengeke huner-xêrxwazî lidarxîne ji bo kesûkarên me li Rojava yê Kurdistanê, û ji ber vê yekê: em hemû revenda kurd û Kurdistanî û Sûrî vedixwînin ji bo beşdariyê bikin di vê ahengê de. Wa tê zanîn ko ev aheng ewê bête gêran bi dengê herdû hunermendên kurd (Azad Feqe û Nebez Mukriyanî).